
ظظظظظظظ



ع ع ع ع ع ع ع

# Oğuz Atay

# *Çiroknûsên Li Ser Riya Trênê - Xewnek –*

*Werger W39 BRAHİM RONİZER*

# ÇİROKNÛSÊN LI SER RIYA TRÊNÊ

## -XEWNEK-

Em sê çîroknûs bûn li bajarokekî welêt li dûrî bajarên mezin, bajarokekî li serê çiyayekî, li îstegeheke trênê dixebitîn. Sê xanîkên me hebûn di rex hev de bi kêleka îstegehê vê. Ez, Cihûyê ciwan û jineke ciwan. Me bi gerokî çîrokfiroşî dikir. Tu xêr û bereketa kare me nîn bû, ji ber ku trên pir hindik dihatin vira. Her weha gava ku tenê trênê posteyê dihatin me tu karê hêjaye gotinê nedikir. Di trênên danê êvarê dihatin de bi tenê nan, sicûk, dew û sêv dihatin firotin. Di wê saetê de em çîroknûs gelek caran radiketin. Bi vî hawî me ji bo şevê bêhna awe berdida, ji ber ku hemû hêviya me trêna ekspresê bû ya ku piştî nîvê şevê derbas dibû. Ew firolkarên gerok ên din jî gelek caran wê saetê hişyar nedibûn nedihatin. Em jî (çîrokfiroş) carînan di xew de diman, nedigihîştin trênê. Hekena nava me û şefê îstegehê jî xweş bû; lê belê bê ka çima axleb sersarî dikir û em şîyar nedikirin vî tekane memûrê

îstegehê. Ji alîyekî ve me lê nedigirt; meqes wî diguherandin, karê telgrafê wî dikir, hemû nîşan wî saz dikirin, bilêtfiroşî, vekirin û girtina derîyan, … hemû kar di stûyê mirovekî de bû. Ji bo em xwe pê xweş bikin gelek caran me çîrok belaş didanê; dîsa jî carînan ji bîr dikir ku me şîyar bike. Axleb diviyabû em ji ber xwe şîyar bibin. Heke mirov bîne bîra xwe ku tevahîya rojê jî me çîrok dinivîsîn, wê ayan bûya ku ev ne karekî hêsan bû. Erê, danê êvarê em radiketin; lê exleb berêvarkî ilham dihat û heta derengî şevê jî em ji dest nedifilitîn şefê îstegehê henekê xwe bi vê gotine “em ji dest nedifilitîn” dikir; di wan kêlîkan de, me nedianî bîra xwe ku yekî bi tenê ye, nikare bi hemû karan re bidigîhêje, me bi tûndî ew rexne dikir. Ma xîret nedikir gava eksprês tê heta bi xanîkên me yên bi odeya şeftîyê ve bihata. Ji alîyekî ve em xebatkarê heman kargehê dihatin hesêbê. Tev bi ser de hindek şevan, şîv nedihat bîra me, me çîrokên ku bi desta nivîsandin bi daqtîloya li oda şefê îstegehê careke din dinivîsandin û sererast dikirin. Ji ber ku pêşî min bi dest çîroknûsîyê kiribû hevalên min dora pêşî ya nivîsandina bi daqtîloyê didane min. Lê min gelek caran dora xwe dida Cihûyê ciwan. Min pir ji vî Cihûyê ciwanî zeîfî bîmarî hez dikir.

Erê ji alîyekî ve em xebatkarê îstegeha trênê bûn: xanîkên me jî di nav erdê îstegehê de hatibûn avakirin, bi ser de jî hemû ji yek teşeyî bûn û bi xweserîya mîmarîya avahîya îstegehê hatibûn lêkirin. Şefê îstegehê bi kenewerî digot ‘memûrên çîroknûs’ ji me re. Pêşîn wê gengeşîya bêdawî dest pê dikir: Nêxêr, em di rêza memûran da nayên hesibandin. Sermeselê em serê perçe heqdestê distînin. Jê pê ve, ev heqdest ji ber ku rêwîyên eksprêsê didin ne diravdaneke fermî ye. Hûn çîroknûsên esnafa ne, digot şefê îstegehê ji me re. Ya rast min ne dixwest navê esnaf an jî memurtî li min werê kirin; em hunermend bûn. Diviya em di rêzeke din de buna. Mixabin, di şevên ku firoşkarên nan û sicûq, dew, sêvan hişyar dibûn de dema me hev dehf dida û pesindarîya malê xwe dikir nedihat parastin ku em di ‘rêzeke din de’ bûn. Me jî layî firoşkarên din dikir barebar ji bo em malê xwe bifiroşin. Helbet dengê Cihûyê ciwan hema bêje dernediket; jina ciwan jî di navbera firoşkarên xwarinan û rêwîyên ku dadiketin peronê de asê dima. Ne jixwe malê meyî firotinê ne gelek bû. Bi daqtîloya kevnik ya şefê îstegehê bi kotek me hebek du heb sûretên her çîrokên derdixistin. Nivîsa sûretên paşîyê jî qenc nedihat xwendin, kiroxên

wan jî bi kotek peyda dibûn. Çîrok ku careke dudoyan nehatibûna firotin kevin dibûn; êdî bi kotek kirox ji wan re dihatin dîtin. Ji ber ku me çîrokên rojek du roj ser re buhurî û madeya wan li xwe şikandî dirêjî rêwîyan dikirin, mehdê xwe tirş dikirin, digotin “Em van zanin, tiştên nû nîn in!” û çîrokjîyanên me diavêtin nav çavê me. Wê gavê jî me siûda xwe bi dest firoşkarên dew û sêvan ve berdida.

Kotekîyên me yên din jî hebûn; trên her car li ber xanîkên me nedisekinî. Şefê îstegehê gelek caran wagonê bar li ber perona yekemin disekinandin. Loma, eksprês mecbûr li ber perona (ku zimanê mirov bigere ji wan re peron bibêje) duyemîn heta ya sêyemîn disekinî. Ji ber ku firoşkarên xwarinan pêşî bi vê hisiyabûn li wan deran li hêwîya trênê diman. Ji ber ku em axleb di kêlîka paşî de şîyar dibûn, çav li xew gelek caran pêşî bi pelesûrî li wagonên bar rast dihatin. Paşê diviyabû em li dora wagonan bifitilîyana, din av riya trênê re bi hişyarî derbas bibûna. Ronahîya cîhê trên lê disekinî jî kêm bû. Nexasim ew ji bo me pir girîng bû: Çîrokên me yên bi tomarî di selikên hesîrî de bi dest xwe re nedihatin firotin. Her rêwîyekî

tomar gelek caran diqetandin vedikir qet nebe çavek di rûpelan digerand. Tarîtîyê karê me zor dikir. Ji ber ku rêzik ®> baş nedidîtin, tenê çav lê digeran û li me vedigerandin.

Firotin baş nediçû. Sal salên şer bû. Nan jî biha bû. Ji bili vê gelek caran reşahî dihat lidarxistin, di ser de jî ew ronîyên mirî yên îstegehê nikarîbû berhemê me rohnî bikira. Di şeve welo da xebat bê wate dibû. Di paş pencereyên ku me perdeyên wanî reş reş dinixumand de, di ber kêm rohnîya ew lampên me î bi kaxizên şîn pêçayî, me hewl dida kurte çîrokên xwe binivîsin, bêyî ku em zanibin wê bê ne firotin an na. Şikir ji Xwedê, rêwîyên wagonê razanê hebûn ku wan li tiştên dikirîn hûr nedibûn, di ser de jî du qat dirav didan. Evan rêwîna ji ber ku xwarina xwe li wagona xwarinê dixwarin, wan guh nedidan dewfiroşên qirêt, sevfiroş û nan sicûq firoşan (bi taybetî evana). Ji ber ku di welêt de tekane îstegeha çîrok dihate firotin ev bû, wan pesnê me bihîstibûn. Timî me ji wan qopiya yekemîn vediqetand: Ew kiroxên hendaz bûn. Dîsa jî ne hêsan bû ji nivînên xweyî aram rabin û piştî nîvê şevê şîyar bibin ji bo çirokê. Me jî hêsanîyek peyda kiribû: Me çend qiruş didan memûrên

wagonê razanê û rêwî li îstegeha me didan şîyarkirin (Ji bili wê, serê hatinê çîrokên belaş ji me radigirtin. Ez bawer nakim dixwînin. Dibe ku bi mal avêtî difiotin). Ne ji rêwîyên wagona razanê buna halê me xirab bû. Me bi wan hindeka re têkilî jî danîbû. Ji ber ku hay ji rewşa me î dijwar hebûn, carînan pasta, kulîçeyên dostên wan hatibûn wan bi rê bikin dabûn wan, didane me. Bi şev me çîrok dinivîsand, bi şev me serrast dikirin û bi şev me difirot. Piştî eksprês bi dûr diket em westiyayî bê hal vedigerîyan avahîya îstegehê; li oda panê me ew kulîçeyên rewîyên wagona razanê dabûn me, me dixwarin. Carîna firoşkarên din jî bi me re dihatin. Dewfiroş ew dewê nehatibû firotin îkramî me dikir, çawa be dê hetanî sibehê tirş biba. Dilê wî bi me dişewitî qey. Sêvfiroş jî (ne timi) sêvek diqeşart ji me re. Ê me, min nikarîbû çîrokên xweyî nefirotî bida wan: Xwendin û nivîsa wan yeki jî tune bû. Tenê nan-sicûq firoş carîna –ji me hema kî ba-çîrrok dixwest, bi şertê qopiya dawî be; ji ber ku ji kaxeza tenik bû, bi çîrokên me cixare dipêça.

Carîna wextê ku kêfa min li cih bû, yanî wexta firotin qenc derbas dibû, min ji firoşkarên xwarinê re çîrokên xwe dixwend (jina ciwan li dijî vêya bû).

Bes, hîn di rêzika pêşîn da nan-sicûqfiroş û sêvfiroş di ponijîn, lê belê hetanî dawiyê diman li oda dipanê (di dawiya çîrokê de jî bi xew re diçûn). Dew firoş bi baldarî li min guhdarî dikir; bi ev eleqe ya wî ez kêfxweş dibûm. Hetanî ji -destê- min dihat, min peyivên lehengên çîrokê vedijand, wextê min dixwend. Di dawîyê de nan-sicûqfiroş serê xwe dihejand, dilê xwe xemgîn dikir û 'em di rojên dijwar derbas dibin' digot. 'Tiştê halo dibe' sêvfiroş jî digot: mirov di jiyanê çi tiştna dibînî. Min çîrokên dilşewatî yên qala firoşkaran dike jî nivîsand. Dewfiroş jî bi xew ve diçû wextê evan guhdar dikir.

Şefê îstegehê jî bal nedida nivîsên me, belam nizanim ji ber çi, ji hemû çîrokên me teqez qopyayek digirt û evana bi şêweyekî rêkûpêk dosye dikir û di dolabê de berhev dikir: Rêbazk vê yekê vitîn dike. Ji ber ku di nava erdê rêweberîya rêhesinê de hatiye nivîsîn, dikeve şamîla xala 248an halê me. Wexta behsa xala qanûnê dibû ez bê hemdî xwe hêrs dibûm: Ma qey qanûnên rewşa me baş bike, yên cihekî bi şeref di nava erdê îstegehê bide me nîn bû? Ez timî li dijî wê fêhmberîyê bûm, me bi qanûnê nan-sicûq re hevyek dike. Dîsa gengeşîyek dirêj dest pê dikir: şefê îstegehê kitêbên

reşkapax ji dolaban derdixist, amaje dikir ku di derheqê firoşkarê xwarina de qanûna parêzîya tendurustîyê bi kar tîne.

Bi ya min her diçû rewş dijwartir dibû. Cihûyê ciwan her diçû lawaz dibû. Bi ya min nexweşîya wî ya nepenî hebû. Ji bo tedawîya wî perên me nîn bû. Nexweşxana rêhesinê jî me qebûl nedikir. Ez bi şefê îstegehê hêrs dibûm: bi xisitina me, di bin sîwana xal 248an û çîrokên me ji dest me tu bêje bi darê zore stendîn baş e!. Ma qey qanûnek Cihûyê ciwan bide tedawîkirin tune ye? Hemû zanin ku şixûl ne çê diçe. Gelegot belav dibû derheqê çêkirina rêhesinek nû ku di îstegeha me derbas nabe de, veguhestinek pêşbirîk pêk tîne. Êdî tenê trêna posteyê dê riya xwe bi vir bixe.

Ez di nav xemgînîyan de bûm di ser de jî ez dildar bûbûm. Ez evîndara jina ciwan bûm ya di xanîkên sisîyan de, bêguman. Şevekê ji memûrê wagona razanê yekî me nas nedikir ew ji derîyê wagonê dehf dabû derve. Ketina hundir wagona razanê ji firoşkarê gerok re qedexe bû. Jina ciwan ketibû erda toz tebar, selik û çîrokên wê li erdê belav bûbû. Min ew dilmînî kir, porê wê mist kir jê re got megrî. Li peronê ji bilî me kes nîn bû.

Firoşkarên din zû firotibûn hûrên xwe, ji îstegehê çûbûn, têkiliyên me û wan nexweş bû di kêliyên dawî de: dixwestin ku di wagonê razanê de wek di şûşên girtî, sicûq nanê di nav kaxizan pêçayî tiştên guncan ji bo yasaya parêzîna tendurustî bifiroşin. Memûrên wagonên razanê jî eyar kiribûn. Yarebî çima her roj arîşeyên nû derdiketin? Piştî xwarina di wagona xwarinê da ewqas dixwarin ev rêwîyên wagona razanê têr nedibûn û -kî zane çi dixwarin- piştî nîvê şevê dîsa birçî dibûn. Ji xêra Xwedê me xalek berwext ya rêznameyê dîtibû, ji bo vê yekê cesaret nedikirin nêzîk bibin wagonê razanê. Ev rêznameya bêminasebet jî dê mehek din ji hole rabûya. Em herdu –ez û jina ciwan- di serma şeve de dicirifîn, me xwe li hevûdu pêçabû. Kîjan bayî em avêtibûn vî bajarokî?

Em dixebitîn di mercên çi dijwar de!. Ji mijûlbûna bi firoşkarên xwarina re, bi memûrên trênê re, bi birçîbûnê re, me hunerê xwe nekarîbû sererast bi cih bianîya. Berî her tiştî pirtûkên me î ser rast nîn bû. Di bin ev mercan de dê ji me çi bihata xwestin? Difikirîm, bêhêvîtî û ecayîpbûna rewşa me, min bêtir fam dikir: rêvebira rêhesina ev jûrên mîna qutîka li ber avahîya îstegehê dabûn me,

lê ev ne bi me qencî bû. Ji ber ku teqereq û fîkandina tirênên bi rojê derbas dibû, dibûn asteng em bi aramî razên. Qiymeta nivîsên me li bal wan nîn bû. Di şevek borî de rêwîyekî ciwan û rû serrastî ê wagona razanê gazina xwe kir hin çîrokên me firotibûn wi, biribû rêve î rexnegirekî bi nav û deng kiribû û nivîskarê navdar jî gotibû çîrok gelek ji rêzê ne û moda wan buhurî ye. Peşke baran bû, rûpelên derve yê çîrokên di selikê de şil dibûn. Payîz bû. Ez di nav qazaxên xwe î tenik û peritî de dicirifîm. Di nav ev mercan de min ê tiştên baştir çawa binivîsa? Bi nişka ve bi hêrs û bi dengekî sar min ji rêwîyê wagona razanê ê ciwan re got ku, tu dixwazî çîroka vegerîne a ha ji te re perê te jî. Bi rastî min derew dikir: quriş di bêrîka min de tune bû.

Bi ev ramanan hiş ji sere min çûbû. Min hay ji dora xwe tune bû. Trên bi dûr ketibû. Bi carekê min dît jina ciwan di hembêza min de ye. Nêzî min bûbû û serê xwe pal dabû ser sînga min. Min ew ramûsa. Selikên me î çîrokan min xiste milê xwe û meşiyam ber bi îstegeha me î ku ronahîyên wê dixuya. Wê şevê di nava ramanên têkel yên ji ber bêhêvîtî û tenêtîyê de, bi jina ciwan re me şa kir. A niha gava ez van rêzikana dinivîsim ez ditirsim ji ber

gumana pêdeçûna hestiyarîyên erzan yên çîrokên min î rojane min nivîsîbû di xanîkên xwe î asêmayî di nava firoşgeran, şefê îstegehê ê rûtirş û rêhesina da. Belê min ji jina ciwan hez dikir, ez timi diçûm xanîkê wê. Ji ber ku xanîkê Cihûyê ciwan di ortê de bû wexta ez diçûm cem jina ciwan ez bêgav dimam di ber mala Cihûyê ciwan de derbas bibûyam, eva han ez aciz dikirim. Nexweşîya Cihûyê ciwan jî pêş de çûbû. Êdî wek berê her şev nekarîbû derketa ji bo çîrokfiroşîyê, hejmarên çîrokên wî jî kêm dibûn. Di rojên vê dawiyê de min destpêkiribû çîrokên wî jî binivîsim. Ewqas bêhal bû kû nekarîbû ji vê alîkarîya min jî îtîraz bikira. Dema bi ser xwe ve dihat, diçû ser masê û çîrokên piri kurt dinivîsî, bi ya şefê îstegehê ev yek hindek bû û ji bo î em kiriya xanîken xwe derbixin û li gor yasayek niha nayê bîra min amaje dikir ku divê em bêtir binivîsin. Êdi têkelî mijarê nivîsên me ne bes, têkelî şêweya nivîsên me jî dibû.

Wê demê min destpêkiribû nivîsina çîrokên evîndarî. Bi amajekirina dê bibe sedema kurtepista, şefê îstegehê dixwest astengîyê ji vê jî derxe. Em bêgav diman li ber xwestekên wî serî bitewînin. Em ji vir bihatina avêtin îstegehek trênê yên xanîkên

çîroknivîsê tê de heye, me ê ji ku peyda bikira? Yara min xwarina şefê îstegehê çêdikire: dirûna wî dikir, ji bo na arîşe dernekeve. Şefê îstegehê em biçûk didît, ez ne şaş bim bi rastî timi em tiştek nehesibandibû. Êdî jî angaşt dikir ku em bi xêra îdara rêhesinê nan dixwin, ji ber vê ji me dixwest ku em tenê li ser vê mijarê binivîsin. Xwe mînak dida: ma şefê îstegehê ji bilî rêhesinê tu kar dikir? Min hewante hewl dida zehmetîya peydakirin mijarên nû di derheqê rêhesin da. Bi rastî zanîbû ku em nêzî wî karî nabin. Gef li me dixwar bi gotina xwe yî nivîsa raporên dijî me ji serrêvebir re, ji bo ku metirsiyek nû peyda bike di jiyana ku em di bin şertê dijwar hewl didin berdewam bikin de. Nava me û firoşkarên din jî xirab bû. Di vê quncika xewle a welêt de di ciwaka me î ji çend kesa pêk tê de em bi ser neketibûn, bi hev re bi aramî bijîn.

Min di xwe derdixist ku ez ji hundir xwe de westîyayî me. Her nîvê şevê xewn nîvco mayî, tîtîya trênê, peydakirina çirokên nû ji kiroxên xweşnebîn, cahil an jî rehet û ji xwe bawer re, Cihûyê ciwan ê nexwweşîya wî pê de giran dibe, û şefê me î îstegehê ê bêcirbûna wî her diçe zêde dibe … Yara

min jî westiyayî û of bûbû, ez bêgav mabûm alîkarîya çîrokên wê jî bikem.

Ez têdigîhîştim ku fikrên min tevlihev dibe. Têkilîyên min î bi derveyî îstegehê jî her diçû lawaz dibû.  Êdî roj çawa derbas dibû min nekarîbû bişopanda.  Min nezanîbû roj çawa derbas dibe êdî. Di peydakirina mijarên rojaneyî û di pevxistina mirov û serpêhatîya da wekî berê jêhatîbûna min nema bû.  Rûdawên girîng jî ez fêr nedibûm gelek caran. Belê min hindek nûçe zanîbû.  Şer qediya bû, barê trênê derbas dibûn serbaz bûn, coş bi coş ji enîya şer vedigeriyan.  Demek kurt min çîrokên şer nivîsîn, bi agahîyên nîvco yên min ji wan verdigirt. Di vê heyamê de gelek tişt nedihate bîra min: gelo şer di welatê me de qewimî bû? An jî li çolistanê dûr de?  Axa me fireh bûbû an jî kêm bûbû?  Bi bêh'alîya xwe bi bişirîn Cihûyê ciwan li min vedigerand: piştî îstegeha me timî li cihê xwe bû ma tu giringîya evana hebû?  Di gel ku me dengê topa nebihîstibû şer tu carî nêzîkî îstegeha me nebû bû.

Paşê ji rûyê rêwîyên wagona razanê yên bi rûtirşî çav li çîrokên min digerand, min têderxist ku şer ji zû de qediya ye.  Rêwîyekî jî –rojekê- gote min di navên bajaran de ez xeletîyê girîng dikim.  Navên

rêvebirên me jî min tevlihev dikir, an jî min ji bîr dikir. Ne wêlo, çend sal derbas bûbû min navê mirovan tû carî bi bilindahî deng nekiribû. Di ciwaka me î îstegehê de bi salan me bangî hevûdû nekiribû. Pêwîstîyek wêlo tu carî bi me re çê nebûbû. Navê îstegehê jî, ji ber ku li ser kilsê li dîwarê kêlekê nivîsîbû, jê çûbû, hatibû ji bîrkirin. Ferhengek me jî nîn bû ji bo em li peyvan binêrin wexta pêwîstiyê. Ez bi gumanim tê ne bîra min bêjeyên ji dervî çîrokên ku dive em her roj binivîsin. Em bi firoşkarên xwarinê re ne diaxivîn. Şefê îstegehê jî irnoktîya xwe êdî tenê bi tevgerê xwe nişan dida. Cihûyê ciwan êdî nekarîbû biaxive ji ber nexweşîya xwe. Tiştek bixwesta bi sere xwe amaje dikir. Bi jina ciwan re bêdeng me hevûdu diheband. Ez di demek kurt de hînî vê rewşê bûm.

Bi rastî di derheqê demên kin yên diborin de ez nedigîhîştim qaniek teqez. Ji bilî banîbûnê çareserî nîn bû ji vê rewşê re. Êdî ez ne pir ciwan bum, ji bilî çîroknivîsê jî tu kar ji destê min nedihat. Êdî ez nekarîbum biçûma bajarê mezin, nekarîbûm damezirînim ji xwe re jiyaneke nû. Têkiliyên me ê bi dinyaya dervî îstegehê jî her diçû kêmtir dibû. Ji ber bihabûna rojnama û belavkirina wan î êdî bili bi

trênan, amûrên wekî din, pêşî têkiliya me bi rûdawên rojane re hate birrîn. Paşê xeta rêhesin ya nû vebû û êdî heftê rojekê eksprês dihat. Ev ji bo min jî bi kêr dihat. Êdî min ne dixwest binivîsim kûrte çîrokên hema bi caryekê diqede û min şerpeze dike.

Rojên ku ez ji xanîkê xwe dernediketim, bi giştî min dinivîsî. Tenê teqereqa qondereçîyê cîranê min hişê min tevlihev dikir. Belê, ji ber ku êdî Cihûyê ciwan tune bû, çendakî berê miribû. Bi rastî min dixwest jina ciwan bê li rex min bimînî. Mixabin berî ku ez ev xwestina xwe bînim ziman rojekê – çendakî berê- şefê îstegehê li gel wî qondereçî hat. Mêrik jî hate bi cih bû. Li serê van çîyana karê wî jî ji yên me ne çêtir bû. Ez difikirîm ku pêşniyara veguhestin xanîkê jina ciwan ji qondereçî re bikem. Ez divêjim qey ev fikra min jî pir dirêj berdewam kiribû. Ji ber ku rojekê wexta ku ez çûm xanîkê wî, yanî ji bo na pêşnîyara xwe jê re bejim, … de çi bû bû, hindek hişê min tevlihev bû. Lê belê helo bûbû: yanî jina ciwan çendekî berê çûbû. Belê xanîkê wê vala bû. Di şeveke min çîrokek xweyî dirêj hêj nû xilas kiribû de, ez bi xew de diçûm, li trênê siwar bûbû û çûbû. Di wan rojana de hişê min bêtir

tevlihev bû. Ji ber çi bû ez jî nizanim, ev çîrokên min î dirêj nedihate firotin. Ez divêm qey min bêtir dixwest, ji ber ku ji heftê rojekê difirot. Em nikarin bêjin çîrokên min gewrerastî bûn. Bi zikê niv têr niv birçî min rojê xwe derbas dikir. Rojekê –yanî çendakî bere- rêwîyekî di derheqa çîroka min firotî wî rexneyên tûnd li min kir. Numareyên rûpelan jî tevlihev bûbû. Min jî jê re got ku ev hefteyek e ez birçî me. Nexêr, min jê re negot. Min ji rêwîyekî din –çendek paşê- re got. Min ji rêwîyê çendek berê re hewl da ku bêjim min bi zanetî hemû tişt kiribû. Min gelek tişt ji bîr dikir. Lê belê di derheqê rexneyan de ez bi hestiyar bûm. Di demê helo de, di demê ku ez diketim metirsiyê de ew geşdarîya vedijenî min bi min ve dihat. Dawiyê min winda dikir –demek paşê da. Dema şefê îstegehê ji min re digote dê min ji îstegehê bavêje, êdî ez bi kêr nayêm, ez diketim metirsiyê, ser mesele. Bilakîs li gel kirox lê peyda nedibûn, min digot qey ez çîrokên bêtir qenc dinivîsim. Qondereçî jî di derheqê bûyerên dinyayê de ji min re hindek tişt vedigot. Ez divêm qey qenc nayên bîra min ew bûyerên çi bûn (di derheqê ew bûyeran de). Lê belê tiştê ku hişê min tênagîhê û tevlihev vedigot koyincî, ji min re. Çîrokên min ê min hewl dida ez jê re bixwînim jî li

min guhdarî nedikir. Lê belê ez têdigihîştim ku ew ji hêla zanebûna daxuyanîkirinê da her diçû nirxgiran dibû. Min nekarîbûm evêya bidim têgehandin ji koyincî re. Piştî hevpeyvîna me î dawiyê –kêlîyek din tabîî ji îstegehê çûbû.

Eva, ji çîrokên min ê dawiyê yek e. Mîna vêya, gelek çîrokên min kete ser hev. Çirokên min hemû di hişê min de ne. Hemû baş tê ne bîra min. Belê dibe ku min hemû ne nivîsîbin. Vê demê di hindek şeva de bi banektiya xweyî kevin, ez nîvê şevê şiyar dibim û çîrokên xweyî nû di selika xwe de –an jî selika jina ciwan, an jî selika Cihûyê ciwan yê mirî ye- diedilînim, derdikevim ser rêya trênê. Êdî trên derbas nabe di vir de. Ev rojên dawiyê şefê îstegehê jî xwiya nake, ez nabînim. Ez dibêm qey di betlanê de ye –ji ber ku bi salan e ne çûyî betlanê. Kincên wî jî niha li ser min in. Ez dibêm qey dema ew çûyî, li şûna xwe ez hiştime. Trên jî –nizanim ji bo çi – nayên. De çi bû bû, evana hûrgiliyên girîng nîn in.

Ez ditirsim. Ji ber ku ez dixwazim ji vir dûr herim. Beqal hêj dehyn dayin qut nekiriye. Lê belê ev rewş kêliyek din jî dê berdewam neke. Ji ber şerma min ji beqal pirs nekir, di berê de, kêliyek

berê de, ji ber heman fediyokîyê min ji koyinciyê qondera re jî pirs nekiribû. Yanî min tu navnîşan nezanibû, ji vê yekê dê bawer nekirana, ji ber vê yekê ez li ber xwe diketim. Min nekarîbûm bigotima ji kerema xwe hûn dikarın ji min re navnîşanekê bêjin? Lê, tenê navnîşanek bes bû ji bo min. Dijwarîyek din jî hebû wê demê. Aniha jî heye –yanî di ser de demek borîye jî. Pirsgiriêka ku divêt min navnîşana xwe jî tê da binivîsîyam, ji hişê min der ne diçû. Ez vê çîroka xwe bi hawakî, bi rayekê, bigîhînim xwînerên xwe jî, ezê çawa bidim xwîya kirin ku ez li kî derê me? Ev pirsgirêka jî ji hişê min der naçe. Lê belê, dîsa jî ez dixwazim ji wan re binivîsim, timî ji bo wan binivîsim, bê sekin wan têbigîhînim, bidim zanîn ez li kî derê me.

Ez li vir im xwînerê min î xoşewîst, hûn li ku ne gelo?

26 Ilon 1977.